

Bingehên piştgiriya perwerdehiya taybet li Nordrhein-Westfalen-KUMANJI

Piştgiriya perwerdeya taybetî bi gelemperî li dibistana gelemperî da tê te pêşkêş kirin. Dêûbavan dikarin bê berçav girtina ev mijarê, dibistana taybet bijêrin.

(Rêbaznameya karhînbûna piştgiriya perwerdehiya taybet – AO-SF §1(1))

Piştgiriya ji xwendekarên ku pêwîstî bi piştgiriya perwerdehiya taybetî hene, di dibistanên gelemperî û dibistanên taybet de, bi yek awayî pêk tê. Lê balê, di merc û şertên çibecî kirina vê, cûdahî he ye:

Piştgirî di dibistanên gelemperî û hînbûna hevpar (GL)	Piştgirî di dibistanên taybet
<p>Di hînbûna hevpar de (GL) zarokên ku pêwîstî bi piştgiriya perwerde ya taybetî hene, û zarokên ku pêwîstî bi ev piştgiriya tune ne, bi hevparî di dibistana gelemperî de hîn dibin.</p> <p>Zarokên xwedî pêwîstiyên taybetî , <i>dîtin, bihîstinê, pêwendî û ziman, pêşveçûna fizîkî û tevgerî û herwisa pêşveçûna hestyar û civakî</i> bi asayî bi armancên wekhev di kursa perwerdehiya têkildar di dibistanên gelemperî de dikevin bin perwerdehiyê. Ev tê vê wateyê ku hewcedarî û daxwazyên praktîk yê pêwîst ji bo dibistana bingehîn û dibistana pêşnavendî ji wan re tê çibecî kirin. Ew piştevanîyê ji ber seqeteya xwe digirin û, eger pêwîst be, xizmetên taybetî ji bo mirovên seqet distînin.</p> <p>Herwisa gengaze ku pêş bêt ku li ser zarokên bi pêwîstiyên taybet, cûda ji vê, kursek perwerdehî bi armanca hînbûna cuda an jî pêşveçûna zêhnî, desnîşan bibe.</p> <p>Zarokên bi pêwîstiyên taybet <i>hînbûn an pêşveçûna zêhnî</i> di kursên perwerdehiyê de bi armancên cûda dikevin bin perwerdehiyê. Ew bi hevparî li gel zarokên din ê pola xwe, heta ku gengaze be, di mijarên wekhev de, hîn dibin. Lê belê, armanca armanc û daxwazan bi bi hêza aborî ya wan re hevkarî tene kirin.</p> <p>Di nirxandin xebatê de li ser hewldanê şexsî û pêşketina hînbûnê bal tê kişandin û bi asayî bê destnîşan kirina numareyê û bi şewaza wesif kirinê, pêk tê.</p> <p>Piştgiriya xwedî armancên cuda di dibistana gelemperî de, bi gelemperî bi belgeya dawiya kursa taybetî kursa perwerdehiya hînbûnê an pêşveçûna zêhnî, bidawî dibe. Ji bilî vê, di kursa perwerdehiya hînbûnê de, eger pêwîst be, herwisa standina belgeya dawiya kursa dibistana lîseyê (Hauptschulabschluss) jî gengaz e.</p>	<p>Dibistanên taybetî ser esasa pêwîstiyên taybet ê perwerdehiyê û xizmetên pêşkêşbûyî di kursên perwerdehiyê, ji hev cuda ne. Ew bi tenê zarokên bi yek yan çend hewceyên taybetî qebûl dikin. Piştgirî bi gelemperî di polên biçûk de pêk tê û dibistanan ji amûrên taybetî hene. Ev şolê hinek qazanc û kêmasî hene:</p> <p>Li gor mercên taybetî, dibistana taybetî derfetek kêmtir radesî xwendekaran dike da ku bi xwendekarên din di cîhê rûniştina xwe de ku pêdivî bi piştgiriya taybetî tune ne, pêwendiyên civakî pêk bînin û ji wan mifa bistînin. Ji bo vê yekê, zarok û ciwanên ku pêwîstî bi piştevanîyê hene, li vir li dibistanekî de hîn dibin, ku bi şewazek bihêztir li ser hewcedariyên taybet baldar bin û bibin pispor.</p> <p>Hilbijêrtina dibistanek taybetî dikare her tim alternatîfek mentiqî be, bîryara li ser vê mijarê divê bibaşî bête nirxandin.</p> <p>Heta di dibistanên taybet de jî, di navbera kursên perwerdehiyê di armancên wekhevan armanca cûda jî cûdahî heye. Di piştevanîya heman armancê de, derfetên derfetên îslamî yên perwerdehiya dibistana gelemperî heye.</p> <p>Piştgiriya bi armancên cuda bi asayî dibe sedema bidestanîna belgeyên taybet ê kursên hînbûnê an jî pêşveçûna zêhnî.</p> <p>Ji bilî vê, di kursa hînbûnê de, eger pêwîst be, herwisa standina belgeya dawiya kursa dibistana lîseyê (Hauptschulabschluss) jî gengaz e.</p>

gengaz e.



Pêvajoya pêhesîna hewcebûna piştevanîya perwerdehiya taybetî

Dema qeydkirina zaroka/ê xwe, hûn bixwe dikarin wek dêûbav, daxwazekî ji bo hewcebûna piştevanîya perwerdehiya taybetî di dibistanê de pêşkêş bikin. Di vê demê de, rêberiya dibistanê dikare bi razîbûna we, ev karî bike. Piştê gengaziya pêşkêş kirina daxwazê bi rêya wek dêûbav an jî bi rêya dibistanê heye. Ev kare bi asayî heta sinifa 6 ê gengaz e.

Di her du rewşan de, pêvajoya pêhesîna hewcebûna piştevanîya perwerdehiya taybetî li gorî mercên rêbaznameya karhînbûna piştgiriya perwerdehiya taybet, (AO-SF) pêk tê:

1. Axavtinek **tê di navbera we wekî sergêr û birêveberê polê û / an jî birêveberê dibistanê** pêk bê. Piştê ji aliyê we an jî bi rêya birêveberê dibistanê **tê daxwazek ji bo vekirina pêvajoyê** bête pêşkêş kirin.
2. Civata çavdêriyê li dibistanê daxwazê lêkolîn dike. Eger pêvajo vebe, mamosteyek ji dibistana gelemperî (bi gelemperî rêveberê pola zarokê we) û mamosteyek ji bo perwerdehiya taybetî, dê bibin berpirs ji bo lêkolîn kirina hewceyên perwerdehiya taybetî ji zaroka/ê we re û encamê di **raporek pisporî** de pêşkêş bikin. Di vê mijarê de, tîmek karnasî **tê dîroka bijîşkî û herweha nêrînên li ser tevgerê yan di polê de, lêkolîn bike û pêvajoyên cuda yê ceribandînan nefermî yan standard** pêk dînin. Her du mamoste berpirsin ku bi we re jî bipeyivin. **Derbarê vê yekê de, ew tê li ser rêbaz û encamên ku heta niha bidest xistine, we agahdar bikin.** Pêwîste hûn vê xizmetê bikar bînin.
3. **Eger hewce bike** muayeneyek **bijîşkî li dibistanê** tê pêk we re.. Ji kerema xwe baldar ser wextê di dema ku ji bo muayeneya bijîşkî hatîye destnîşan kirin, beşdar be!
4. Her du **mamoste dê naverok rapora pisporiya xwe li ser perwerdehiyê, ji we re şirove bikin û nêrîna wa bipirsin.** Herwisa hûn dikarin ji wan **bipirsin ka perwerde bûna zaroka/ê we di vê dibistana taybetî de pêwîste an na** eger pêwîstî bike, daxwazên peywendîdar qeyd bikin. **Qeyda vê hevdiîtinê herdem beşek berdeham e ji rapora pisporî.**
5. **Civata Çavdêriya Dibistanê** ku li ser ev karî berpirse, li ser esasa rapora pisporî, **derbarê pêwîst bûna piştgiriya perwerdehiya taybetî, pêwîstiya taybet yan pêwîstiyên taybet, û, eger pêwîst be, pêwîstbûna piştgirî bi armancên cûda, biryarê digire.** Ji bo lihevkirina derbarê piştgiriya ji zaroka/ê we di pêşerojê de, gengaze ku ji aliyê Civata Çavdêriya Dibistanê, axavtinek di bi we re pêk were, ku hûn dikarin ji bo ev karî, kesek cihê baweriyê bi xwe re bînin.



6. **Civata Çavdêriya Dibistanê tê biryarê bi nivîskî ji we ragehîne,** û dibistanek gelemperî ji we re pêşniyar bike, ku di nav de xizmetên hînkirina hevpar, pêşkêş dibe. Eger hûn xwendina di dibistanek taybetî de dixwazin, dibistanek taybetî dê ji we re bête pêşkêş kirin. Eger ew ne hemen dibistan be ku zaroka/ê we niha di nav de dixwîne, divê hûn bi lezgînî zaroka/ê xwe **li dibistana pêşniyarî de qeyd bikin.**

Qeyd kirina li dibistana gelemperiyek din, ku di nav de hînkirina hevpar tê pêşkêş kirin, di esasê de gengaz e. Lêbelê, dibistan tenê dikare li çarçoveya cihê xwe yê vala û tenê paş qebûl kirina Civata Çavdêriya Dibistanê û Civata Rêveberiya Dibistanê, xwendekarên ku pêwîstî bi piştgiriya perwerdehiya taybetî hene, bipejirînin.

7. Bi kêmanî **salê carekê, konferansa polî**, lêkolîn dike ka derbarê zaroka/ê we de, **pêwîstiya naskirî ji bo piştgiriya perwerdehiya taybetî** û pêwîstiyên taybetî yên diyarkirî, her berdewamin an na. Eger guhertinek yan bidawî anîna piştgiriya perwerdehiya taybetî pêwîst bike, dibistan dê we ji hevpeyvînekê re vexwendin bike û çalakiyên kêrhatî di vê babetê de pêk bîne.

Eger piştî şewira bi birêveberê dibistanê, koma polî û eger pêwîst bike, mamosteyên pispor ên ku li dibistana we dixebitin, hûn dikarin bi kêfxweşî serdana Îdareya Perwerdehiyê li herêma EnnepeRuhrKreis bikin.